Giringiya wergerê

Emîn Narozî

Bi rastî rola wergerê bi gelemperî di pêşveçûn û tekûzkirina ziman û edebiyata hemû zimanan de û bi taybetî jî di zimanekî weke yê kurdî de ku li piraniya Kurdistanê bi deh salan qedexe û bindest maye û gelek pertûk û berhemên ku pê hatine nivîsîn jî yan hatine kêmxistin, yan jî gelek caran ji holê hatine rakirin. Gelek giring û ew hinde jî pêwîste . Heçî di warê edebiyatê de ji xwe bêguman hewcedariyeke pir bi wergerandina temamê kilasîkên cîhanê yên hemû serdeman heye û her weke hemû edebiyatên cîhanê wêjeya me jî dê bi wergerandina hemû kilasîkên kevnar û yên vê hezar sala dawî bigehê radeya wêjeya cîhana rewanbêj û bedew.

Ji xwe çawa ku ji her edebiyatnasî re jî diyare, wergera baş ji bilî manedarî, struktûr û awayê bikaranîna zimanî di rewş û warên cuda de, ew hem di hevoksaziya zimanî de, hem di dewlemendkirina peyv û gotinan de û hem jî di hevokristinê de ji hêla edebî ve wî dexemilîne. Bêguman ji hemûyan girîngtir jî hevnasîna bi zimanên cihê re ye ku bi vê hevnasînê pêwendiyên ziman jî weke yên mirovên pê axêv xurt dibin û ew jî weke kesê geriyayî û dinyadîtî pê agehdar dibe û pê re jî xwe nû dike.

Vêca gava ku mirov li ser vê yekê li dîroka zimanan jî dinêre mirov hingê qenc dibîne ku gelek zimanên dewlemend û bi pêşketî di dema xwe de, zorê dane karê wergerê û xwe pê bi pêş xistine. Weke nimûne, zimanê erebî di destpêka hatina îslamê de bi xêra wergerên ji tekstên îbranî, aramî û helenî serê pêşî yên leşkirî û dûv re jî peymanên bazirganî digel qeyd û bendên bacwergirtinê û



peymanên bêş û tarên rê û erdiyeyê, hevoksaziya xwe ya di warê pexşanê de bi pêş xistiye. Her weha piştre jî di serdema emewiyan de wergerên deqên girekî (yûnanî) yên felsefe û mentiqê weke felsefeya Arîsto û Isagogé (Îsaxociya) Porfyrios Sûrî (Tyros) û hinekî din bi taybetî jî, li ba wergêrên suryanî ve û belkî jî wergerana hemû kilasîkên yûnanî yên hingê bûye xebateke balkêş ji bo xurtbûna zimanê erebî.

Ji xwe piştî sedsala 18-19-ê jî dema zana û rewşenbîrên dewletên ereban ji Ewrûpayê vegeriyan welatên xwe hingê bi wergerana gelek idyom û frasên zimanê ewrûpî yên mîna digel wê/wî, tevlî wê/wî, çend zû ew hinde çêtir, çendî kar xweş be ew hinde nexweşî jî kêmtir dibe, bi derbasbûna şevê re dengê wî jî bilindtir dibû û gelekên din zimanê erebî nûjen û xurttir kir.
Ji xwe di destpêkê de wergerandina çîrok û tekstên zimanên îranî û hindî bo erebî ji aliyê bêje û gotinan ve ne kêm alîkariya erebî kiribû.

Zimanê ewrûpiyan jî, ji bilî girekî dîsa hem bi wergera berhemên mîna Homeros ji zimanê yûnanî, încîl û berhemên din ji aramî/kildanî/suryaniya kevnare û dîsa yûnanî, ji erebî jî çîrokên mîna Hezar û yek Şev û yên din zimanê xwe baş bi pêş de birine. Digel ku van hemûyan jî ji wergerana tekstên Kong fuzi (konfucius/konfuçyus) jî sûd wergirtiye.

Tirkan jî piştî serdema komarê weke emewiyan bi pera û bi zorê be jî dîsa klasîkên ewrûpî yên serdema romantîkê, ya agehdarî û bîreweriyê, ya realîzmê hemûyan pêkve dane wergerandin bo zimanê tirkî û her weha ji farisî, erebî û gelekên din jî berhem wergerandine û bi saya wan wergeran zimanê xwe yê nûkirî pê dewlemend û xurt kiriye.